

Reftara xwendekar

Kaxeza rastiyê ya dêûbav/lênerînan

Reftar

Em dixwazin ji bo zarokê we xwendegeheke û bextewar misoger bikin. Piştgiriya reftara xwendekaran ji bo pêşvebirin, mijûlkirin û rakirina performansa xwendekaran û başbûnê gelek girîng e. Xwendegeh armanc dikan ku hawîrdorên fêrbûna tevhev yê hevkar, piştgirî û hevgirtî peyda bikin. [Peymana Civaka Xwendegehê](#) diyar dikan ku ev ji bo dêûbav, lênerînan, perwerdekar û karmendên xwendegehê çawa xuya dikan.

Stratîjiya Reftara Xwendekar

Stratîjiya Reftara Xwendekarên me ([Student Behaviour Strategy](#)) alîkariya avakirina sîstêmeke perwerdehiya tevlihev dikan ku tê de her xwendekarek tê nasîn, nixandî û lênerîn, û hemî xwendekar dikarin bi tevahî şiyana xwe fêr bibin. Em dizanin ku xwendekarên ku xwe piştgirî û ewledar hîs dikan, îhtîmal e ku di fêrbûna xwe de bêtir bi dibistanê ve girêdayî bin û beşdarên çalak bin.

Başbûna hawirdora fêrbûnê yê erênî û rêzdar, tevlêbûn û pêşkeftina akademîk pêşve dibe. Stratîjî piştgirî dide rêgezeke pêşîlêgirtin, erênî, baldana-xwendekar, civakamalbata-xwendegehê ku tê de domdarî bingeîn e. Pêdiviyên hemî xwendekaran dê ji hêla Berdewamiya Lênerînê ([Care Continuum](#)) ve bêne peyda kirin.

Koda Reftarê ji bo Xwendekaran

Koda Reftarê ji bo Xwendekaran ([Behaviour Code for Students](#)) reftarên ku li hemî xwendegehên giştî yê NSW tene hêvî kirin diyar dikan. Xwendegeha zarokê we dê hêviyên reftarê yê ku dê di dxwendegeha wan de werin hêvî kirin jî pêşve bibin. Karmendên xwendegeha zarokê we dê reftariya hêvîdar fêr bike û bipejirîne.

Reftarên xembar

Zarok û ciwan carine dikarin reftarên dijwar wek beşekî normal ya mezinbûnê nîşan bidin. Dibe ku zarokê we ji ber reftarên kesên din tesîr bûbe yan jî li ser kesên din tesîr kiribe. [Heke zarokê we ji we re behsa piştgirîkirinê reftar yê li xwendegehê kiribe](#), di malpera înternetê de agahiyên zêdetir hene.

Zêdetir agahdarî

Heke hûn dixwazin derbarê [piştgirîya reftarê](#) bêtir zanibin yan di derheqê reftara zarokê xwe de bi xemîn ji kerema xwe bi xwendegehê re têkiliyê daynin.

Xizmeta wergerandina telefoni

Heke hûn dixwazin bi xwendegehê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çî zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefone xwendegehê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.